



ÎMKANÊN DIMİLÎ YÊN XWEPARASTINÊ Û HÊZA WÊ YA JÎYANÊ LI HERÊMA DÎYARBEKİRÊ

Ayhan YILDIZ*

Makale Türü/Article Types: Araştırma Makalesi/Research Article

Makale Geliş Tarihi/Received: 09.05.2022

Kabul Tarihi/Accepted: 17.06.2022

Atf: Yıldız, A. (2022).

“Îmkanên Dimilî yê Xweparastinê û Hêza Wê ya Jîyanê li Herêma Dîyarbekirê”,
Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi, 16, 7-29.

DOI: 10.56491/buydd.1114311

KURTE

Dimilî (Zazakî/Kirmanckî), wekî ziman û dîyalekt, dimilîaxiv jî wekî aîdîyeta qewmî, di nav lêkolînerên kurmanc, kirmanc û bîyanî de serê sedsalekê ye wekî mijara nîqaşê di lîteraturê de cih girtîye. Qismekî mezin ên axiverên dimilî li Dîyarbekir û derdora wê digel axiverên kurmancî dijîn. Li pêşberî rewşeke zehmet dimilî, hin edîb û zanyar bi derfetên xwe yê kêm û tixûbkirî ji salên 1990î ve ji bo parastin û bipêşvebirina dimilî li vir dixebitin. Dewleta Komara Tirkîyeyê piştî salên 2000î bi derfetên xwe yê fermî yê zanîngehên xwe, mekteb û sazîyên weşanê piştevanîya dimilî dike. Çi heye ku rê li ber seyra lawazketin û qelsbûna dimilî nehatîye girtin. Sazîya UNESCOyê di rapora xwe ya 2009an de dimilî wekî zimanekî ku jîyana wî di xetereyê de ye li qelem da. Li ser vê yekê, vê xebatê da ber xwe ku rewşa rasteqîn a dimilkî li herêma Dîyarbekir û derdora wê bi rêbaza gera li sehaya devkî û nivîskî bi teknîkên hevdişîn, çavdêrî û têgerîna jêderan (lîteraturê) li ber çavan raxîne û bi vê lêkolînê zêdebarîyekê li zanista vê qadê zêde bike. Di encama vê lêkolînê de bi daneyên tecrubî yê ku ji nufûsa sehayê (universeyê lêkolînê) hatin berhevkerin, bi taybetî jî ji hêla axaftin û pêwendîya zarî (devkî) ve dîyar bû ku digel van derfetên şexsî, civakî, dezgayî û dewletî ku palpiştîya dimilî dikin, hêza wê ya li jîyanêmayînê hîna jî hindik e û ew li vê herêmê di xetereyê de ye.

Bêjeyên sereke: Rapora UNESCO, zimanên mirî, derfetên dewletê, dimilî

* Öğr. Gör. Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü Kürt Dili ve Kültürü Ana Bilim Dalı, Mardin-Türkiye. e-mail: ayhanyildiz@artuklu.edu.tr, **Orcid:** 0000-0002-8763-4182

Zazaki's Self Protection Opportunities and Survival Strength in Diyarbakir Region

Abstract

Zazaki as a language or dialect and Zazaki speakers in terms of ethnic belonging has been in the literature as a subject of discussion among Kurmanç, Soran and foreign researchers for about a century. Most of the Zaza speakers live together with Kurmanji in Diyarbakir and its environs. In the face of the difficult situation of Zazaki, some scholars and scientists have been working here for the protection and development of Zazaki since the 1990s, with their own limited and limited means. The State of the Republic of Turkey supports Zazaki with its official universities, schools and broadcasting institutions and facilities after the 2000s. However, the decline and weakening of Zazaki could not be prevented. UNESCO listed Zazaki as a vitally endangered language in a report. Therefore, this study aimed to reveal the real situation of Zazaki in Diyarbakir and its surroundings, by going down to the field, collecting oral and written data, using interview, observation and bibliography research techniques. In this way, it aims to make a contribution to scientific studies in this field. As a result of this research, according to the experiential data obtained from the study universe, especially in terms of speaking and verbal relations, it was revealed that despite the personal, social, institutional and state facilities that support Zazaki, the survival power of Zazaki is still low and is in danger in this region.

Keywords: UNESCO report, dead languages, state facilities, Zazaki

Zazacanın Kendini Koruma İmkanları ve Diyarbakır Bölgesinde Hayatta Kalma Gücü

Özet

Zazaca bir dil veya lehçe olarak ve Zazaca konuşucuları etnik aidiyet açısından Kurmanç, Soran ve yabancı araştırmacılar arasında yaklaşık yüz yıldır tartışma konusu olarak literatürde yer almaktadır. Zazaca konuşucuların büyük bir kısmı Diyarbakır ve çevresinde Kurmançlarla iççe yaşamaktadırlar. Zazacanın zor durumu karşısında bazı edîp ve bilim insanı, kendi az ve sınırlı imkanlarıyla 1990'lı yıllardan bu yana burada Zazacanın korunması ve geliştirilmesi için çalışmaktadırlar. Türkiye Cumhuriyeti Devleti, 2000'li yıllardan sonra resmi olan üniversite, okul ve yayın kurum ve imkanlarıyla Zazacayı desteklemektedir. Ne var ki Zazacanın gerileme ve zayıflamasının önüne geçilememiştir. UNESCO, 2009 yılındaki raporunda Zazacayı hayati tehlike altında olan bir dil olarak kaydetti. Bu yüzden bu çalışma, Zazacanın Diyarbakır ve çevresindeki gerçek durumunu, sahaya inerek, sözlü ve yazılı veriler toplayarak, görüşme, gözlem ve kaynakça (literatür) araştırması teknikleriyle göz önüne sermeyi amaç edindi. Bu şekilde bu alandaki bilimsel çalışmalara bir katkı yapmayı amaçlamaktadır. Bu araştırmanın sonucunda çalışma evreninden elde edilen tecrübi verilere göre, özellikle de konuşma ve sözlü ilişkiler açısından ortaya çıktı ki Zazacayı destekleyen kişisel, toplumsal, kurumsal ve devlete ait imkanlara rağmen Zazacanın hayatta kalma gücü hala azdır ve bu bölgede tehlike altındadır.

Anahtar kelimeler: UNESCO raporu, ölü diller, devlet imkanları, Zazaca

1. Destpêk

Rewşa dimilî li pêşberî soranî û kurmancî, di nav lawazîyê de xuya dike. Ji ber ku dimilîxav ji derfetên maddî yê dewletî û palpiştiya manewî ya gelên der û cîranên xwe mehrûm mabûn, hejmara wan kêr dibe û her roja ku bi ser de derbas dibe, ev rewş bifikartir dibe. Digel ku li ser axa vê niştimanê dimilî digel erebî, farisî, tirkî, suryanî, kurmancî, hewramî û soranî dijî jî, dîsa tirs û fikareke mezin heye ku ew jî mîna suryanî bikeve nav koma *zimanên mirî* yê dunyayê. Helbet ji bo lêkolînerên zimannasîyê, pêdivîya helwesteke zanistî ye ku pê re meşxûl bibin û li ser vê rewşa wê ya metirsîdar lêkolînan bikin û li çareserîyan bigerin. Ji ber ku ev hêla daxdar a dimilî bi awayê ku pêdivî pê heye nehatîye nirxandin, vê lêkolînê ev mijar daye ber xwe.

1.1. Problema Lêkolînê û Gera li Lîteraturê

Piştî ku dimilî ji hêla alfabe, fonolojî, gramer, edebîyat, weşan û weşanxaneyan ve bihête nikirandin, nîyet bi vê xebatê ew e ku di nav vê rewşa wê ya bixeter a manûnemanê de, balê bikêşe ser realîteya dimilî, sedemên rewşa wê ya xerab, bi yarmetîya zanayên wê yê nîspor û zanyarên kedkar, bi awayekî zanistî tesbît bike û bi vî awayî dormedorên peywendîdar ên ku bi girîfteyên giştî yê dimilî re têkildar dibin, bi asta wê ya bixeter, bi awayekî karîger bide ponijandin. Ji bo vê mebestê ev lêkolîn hewl dide ku li çareserîya vê pirsê bigere: “Gelo derfetên ku dimilî li herêma xwe karibe di vê sedsalê de hebûna xwe pê biparêze çiqas hene?”

Wekî pirsên têkildarî pirs û pirsgerêka sereke, ev pirsên talî yê jêrîn jî peywendîdarê rêya çareserîyê ne û di pêvajoya lêkolînê de dê hewl bihê dayîn ku bersiva wan bihê dayîn: Gelo parastina dimilî tenê bi piştevanîya dam û dezgayên dewletê mumkun e? Gelo malbat û zarokên dimilî çiqas dilxwaz in bi dimilî biaxivin. Gelo nivîskar û lêkolînerên dimilî li ser jîyan û pêşeroja dimilî çi difikirin.

Îcar, gava ji bo çareserîya pirsgerêkê mirov derdikeve sehayê, dikeve gera lîteraturê û li xebatên berê yê lêkolîneran digere, dibîne ku di vê qadê de wisa zêde hewldanek di biwarê de nehatîye dayîn. Tiştê ku bi ber çavê dikeve ew e ku piranîya lêkolîneran li ser dîrok, cografya, aîdiyeta qewmî, gramer û edebîyata dimilî xebitîne.

1.2. Girîngîya Mijarê

Dimilî bi alîyê xwe yê fonolojîk û kangeha xwe ya ferhengî, ji kurmancîya jorîn zêdetir, dişibe kurmancîya jêrîn, soranî. Dimilî, çend taybetmendiyên rêzimanî, hîna jî di hundirê xwe de diparêze ku ne di kurdîya kurmancî de, ne jî di ya naverast de mane. Heger rêziman û kana wê ya ferhengî bihê parastin, meriv dikare bigihîje wê qenaetê ku feydeya wê dê bigihîje herdu kurmancîyan jî. Ji ber ku parastina dimilî ji bo kurmancan girîng e, bivê nevê

eleqedarîya wan a pê ra jî girîng e. Wisa dîyar e ku arîşeya bikarneanîna dimilî di jîyana rojane de, beşek ji girîfte û arîşeyên giştî yên kurmancî ye. Hemû alîyên kurmanc, soran, hewraman-goran berpirsîyarê çareserîya vê arîşeyê ne.

2. Rêbaz

Xebatên gramerî, dîrokî û edebî yên dimilî ku lêkolîneran li ser dimilî kirîye û ew derfetên ku dewletê bi dam û dezgayên xwe yên fermî piştevanîya dimilî dike çî karîgerî li ser parastin û bipêşvebirina dimilî kirîye di vê lêkolînê de dê bihê vekolîn.

Amadekarê vê xebatê, ji biçûkatîya xwe ve li herêma xwe herêma Xerzan*, ji bav û kalan ve dost û hevnasê malbatên dimilîyan e. Ji salên 1995an pê ve bi malbatî û bi awayê aktîf wekî der û cîran di nav malbat, heval û hogirên kirmanc de dijî. Ew weşan û xebatên ku li ser dimilî derdikevin dişopîne. Wekî xwênerekî aktîf ê dimilî, di biwarê qada edebîyata devkî ya dimilî de ketîye nav lêkolînê. Ji bo naskirina kirmancîya herêma Dêrsim (Tunceli), Sêwreg (Siverek), Çermûg (Çermik), Hezo (Kozluk), Hawêl (Baykan) û herêma Bingolê, çûye van deveran û berê dêhn û bala xwe daye ser rewşa asta axiverên dimilî û taybetmendiyên devokên wan. Ji bo ku ev xebat bigihêje encamên zanistî, helbet ji belge û dokumentên nivîskî, kesên zindî yên di warê xwe de pispor in û ji zanayên pêbawer mifa hatîye wergirtin. Ji bo ku tesbîten zanistî derkevin pêş, bi awayê zanistî ji çavkanîyên curbicur sûd hatîye wergirtin. Helbet mebest bi vê xebatê ew e ku çareserîya arîşeyê hêsantir bibe.

Piştî ku rewşa giştî ya dimilî ji hêla xweparastin û berhemên rêzimanî ve bête tesbîtkirin, dê hewl bihê dayîn, bê ka gelo li gor cografyaya xwe dimilîaxiv, zimanê xwe di çî astê de bi kar diênin. Ji bo vê jî di vê lêkolînê de asta bikaranîna dimilî ya axiverên herêma Dîyarbekir ji salên 2010an heta 2020î li ber çavan hatine girtin. Di vê maweyê de çavdêrî li ser zarok, pîrek, ciwan û pîrekalan hatîye kirin bê ka gelo ew di jîyana xwe ya rojane de çiqas li bernameyên dimilî temaşe dikin, guhdarî dikin, çiqas bi dimilî diaxivin, dixwênin û dinivîsin.

Ji bo vê lêkolînê tecrubeyên nivîskarê vê gotarê yên deh salî (2010-2020) wekî bingehe hate danîn ku nivîskarê çavdêrî li ser bi malbatên navborî kiriye û bi hin nivîskarên edebîyata dimilî re hevdiîn kirine. Di van çavdêriyan de zêdetir ev pirs hatin kirin: “1. Gelo dikarî bi dimilî biaxivî? 2. Tu li bernameyên dimilî yên TVyan temaşe dikî? 3. Gelo tu kovar û pirtûkên dimilî dikirî û dixwênî? 4. Gelo tu dizanî bi dimilî binivîsî?” hatine pirsin. Di hevdiîtinên bi

* Bi kurmancî “Xerza”; bi tirkî “Garzan” ji herêma bakurê Batmanê re dihê gotin. Bi tevî navendan, gundên nêz ên derdora navçeya Sason, gundên nêzkî Hezo (Kozluk), gundên rojavayê Hawêl (Baykan) û bi qismî gundên bakur ên Kurtalanê di nav tixûbên vê herêmê de ne. Li gundên derdora Hezo û Hawêl şênîyên ku bi zazakî dipeyivin, ji bo xwe tenê navê “dimilî” bi kar diênin. Lewre di vê xebatê de herî zêde ev bêje hatîye tercîhkirin.

nivîskar û lêkolînerên dimilî re jî pirsên mîna “1. Gelo rewşa dimilî çawa ye? 2. Gelo ew derfetên ku îro dewletê bi zanîngeh, dibistan û TVeyên xwe li ber dimilî danîne têra parastina dimilî dikin? 3. Bi rastî jî ew temenê ku UNESCOyê ji bo dimilî dîyar kirîye rast e?” hatine pirsîn.

3. Lîteratura Qadê

Gezik (2004) di lêkolîna xwe de balê kêşaye ser marjînalbûna zazakî û li sedemên vê yekê gerîyaye.¹ Ew di pey pêvajoya lêkolîna xwe de gihaştîye wê encamê ku zazakî, ji ber ku di cografyaya xwe de tenê bi awayê devkî maye, ji xwe re di jîyana nivîskî de cih nedîtîye marjînal bûye û roj bi roj ber bi wendabûnê ve diçe.

Söylemez (2011) di teblîxa xwe ya bi navê “Geçmişten Günümüze Zazaca Dergiler: Kronoloji, Sorunlar ve Çözümler” beşdarî Sempozyuma Zimanê Zazakî ya Zanîngeha Bingolê bûye û piştî ku kovarên ku bi zazakî nivîs belav kirine hejmartine, wî dor anîye ser pirsgrîkên weşangerîya kovargerî ya zazakî û bi çend pêşniyazên rêya çareserîyê lêkolîn bi dawî kirîye.

Keskin (2011) di lêkolîna xwe ya “Zazacadaki Alfabe Sorununa Bir Bakış ve Çözüm Önerisi” de tenê li ser rewşa zazakî xebitîye û hewl daye ku rêya çareserîyê ji bo pirsgrîka zazakî ya nivîskî bibîne. Ew di xebata xwe de gihaştîye wê encamê ku divê ji bo zazakî alfabeya latîn a li ser bingeha alfabeya tirkî bihê tercîhkirin.

Varol (2011) bi lêkolîna xwe ya bi navê “Zazaca Sözlükçülüğün Tarihi, Sonrası ve Çözüm Yolları” berê balê kêşaye ser pirsgrîkên alfabe, awayê nivîsîna standard, dariştina bêjeyên nû, ferheng û wergerê jî. Di vê lêkolînê de ew gihaştîye wê qenaetê ku ji bo dahatîyeke hêvîmend divê konsensusek di nav xebatkarên zazakî de çê bibe.

Çimen (2011) di teblîxa xwe ya “Zaza Dili Derslerinin Türkiye’de Kreş ve Okullarda Okutulması” karîgerîya zimanê dayikê ya di rewşa psîkolojîk a zarokan de daye ber xwe û têkildarî rewşa zazakî li serê lêkolîn kirîye.² Ew di lêkolîna xwe de gihaştîye wê encamê ku gava zarok perwerdeya xwe ya bingehîn bi zimanê xwe bibînin, ji hêla dil û derûnîyê ve tenduristîya wan baş dibe. Zarokên malbatên zazakîaxiv heke derfet bibînin ku zarokên wan perwerdeya xwe ya eslî bi zimanê xwe bikin, dê zimanê xwe biparêzin.

Karabeyeser (2011) di xebata xwe ya “Bir Kitle Aracı Olarak Televizyonun Zazaca İçin Önemi” gihaştîye wê encamê ku di nav axiverên zazakî de axaftina zazakî li ber tirkî ketîye

¹ E. Gezik, Dinsel, *Etnik ve Politik Sorunlar Bağlamında Alevi Kürtler*, Kalan Yayınevi, İstanbul, 2004.

² Bnr. Hakkı Çimen, “Zaza Dili Derslerinin Türkiye’de Kreş ve Okullarda Okutulması”, *1. Uluslararası Zaza Dili ve Edebiyatı Sempozyumu (13-14 Mayıs 2011)*.

rewşa şermkirinê.³ Ku dewletê di kanala xwe ya televîzyonê de cih da zazakî, demildest feydeya wê çê bû. Bêjeyên modern bi vê rêyê gihaştin axiveran, rê li ber standardbûnê vebû, bawerîya axiverên zazakî bi wan çê bû ku zazakî têra jîyana serdemê dike.

Kayıntu (2011) teblîxek bi navê “Kaybolma Tehlikesi Karşısında Zazacanın Geleceği” di *Zaza Dilî Sempozyumu* ya Zanîngeha Bingolê de pêşkêş kirîye û diyar kirîye ku ji bo jîyana zazakî, serê pêşî divê TV bi zazakî weşanê bikin, di nav civakê de meşrûbûna wê derkeve pêş, bibe zimanê perwerdeyê, dewlet lê xwedî derkeve, dê axiverên wê jî di jîyana xwe ya rojane de bi awayekî aktîf wê bi kar bînin û dê ji mirinê xelas bibe.⁴

Eren (2011) di teblîxa xwe ya “Dil ile İnsan Sferi Arasındaki İlişki” de li ser berhemên edebîyata devkî ya zazakî xebitîye û wî di vê lêkolînê de ew encam bi dest xistîye ku zimanek, bi berhevkirina materyalên wî yê gel ên mîna çîrok, pêkenî, dua, nifir, biwêj, gotinên pêşîyan, manî, tiştonek, dijûn/çêr û gotinên sondan dikare li dijberî mirinê li ber xwe bide.⁵

Türel (2011) di teblîxa xwe ya “Zazakî'nin Geliştirilmesi İçin İlk Yapılması Gerekenler” de berê lêkolîna xwe daye ser rê û rêbazên bipêşvebirina zazakî û ew gihaştîye wê encamê ku divê di biwarê de ferhengê xebatên berfireh bihên kirin û bi vî awayî rê li ber wendabûna bêjeyên kirmanckî bihê girtin.⁶

Çiçek (2011) bi lêkolîna xwe ya “Siyaset Dili Olarak Zazaca” xwestîye rêyeke çareserîyê ji bo bipêşvebirina zazakî tesbît bike û ew di vê xebata xwe de gihaştîye wê encamê ku gava zazakî di biwarê jîyana sîyasî de wekî zimanê ragihandinê bihê bikaranîn dê ji wendabûnê xelas bibe.⁷ Bi tevî vê, heke zazakî bibe mijara lêkolînên zanistî yê zanîngehên Tirkîyeyê, di weşan û bultenan de bi awayekî azad bihê bikaranîn û bi taybetî jî dewlet, di dam û dezgayên xwe yê mîna rêveberî, tv, tenduristî, perwerdeyî, dînî û çandî de cih bide zazakî dê zazakî jîyana xwe berdewam bike.

Varol (2015) gotarek bi navê “Unesco'nun Dil Raporlarına Göre Zazacanın Durumu ve Geleceği” nivîsîye û balê kêşaye ser rewşa bifikar a zazakî.⁸ Lêkolînerî di lêkolîna xwe de

³ Bnr. Ayetullah Karabeyeser, “Bir Kitle Aracı Olarak Televizyonun Zazaca İçin Önemi”, *I. Uluslararası Zaza Dili ve Edebiyatı Sempozyumu (13-14 Mayıs 2011)*.

⁴ Ji bo berfirehîya teblîxê bnr. Ahmet Kayıntu, “Kaybolma Tehlikesi Karşısında Zazacanın Geleceği”, *I. Uluslararası Zaza Dili ve Edebiyatı Sempozyumu (13-14 Mayıs 2011)*.

⁵ Hıdır Eren, “Dil ile İnsan Sferi Arasındaki İlişki”, *I. Uluslararası Zaza Dili ve Edebiyatı Sempozyumu (13-14 Mayıs 2011)*.

⁶ Bnr. Vehbi Türel, “Zazakî'nin Geliştirilmesi İçin İlk Yapılması Gerekenler” *I. Uluslararası Zaza Dili ve Edebiyatı Sempozyumu (13-14 Mayıs 2011)*.

⁷ Bnr. M. Fatih Çiçek, “Siyaset Dili Olarak Zazaca”, *I. Uluslararası Zaza Dili ve Edebiyatı Sempozyumu (13-14 Mayıs 2011)*.

⁸ Bnr. Kemal Varol, “Unesco'nun Dil Raporlarına Göre Zazacanın Durumu ve Geleceği”, *Turkish Studies*, 2015, j. 10/2, r. 997-1006.

rist û rola karîger a dewletê ji bo parastina zazakî derxistîye pêş û amaje bi derfetên mezin ên mîna TRT 6, MEB û YOKê kirîye ku bê ka çiqas feydeya wê gihaştîye zazakî. Ew di vê xebatê de gihaştîye wê encamê ku herçiqas weşan û çapemenî ji bo zindîtiya zazakî girîng e jî, xwedîderketina civaka zazayan bi xwe jî di parastina zimanê wan de faktoreke zêde girîng e.

Akın (2016) di lêkolîna xwe ya “Diasporada Dil Planlanması: Kurmanca ve Zazacanın Karşılaştırmalı Analizi”, xebat û têkoşîna ji bo parastina kurmançî û kirmanckî (zazakî) bi hev re kirîye mijar. Wî di vê lêkolînê de “modela M. Nahir” ji bo plansazîya bipêşvebirin û parastina zimanan bi kar anîye. Di vê çarçoveyê de wî berê balê kêşaye ser têkoşîna “Komisyona Kurmançî” û “Koma Xebatê ya Vateyê” ku wan ji kengê ve li kê derê çawa ked di ber zindîkirin, standardkirin, xwerûkirin û berbelavkirina ziman, modernîzekirina bêjeyan, hevgerîna termînolojîk, di nav dîyalektan de peywendîdarîkirin û parastina bikarnîna zimanî daye.⁹ Lêkolînerê cext daye ser her cure çalakîyên wan ên sosyal, aborî, perwerdeyî û sîyasî ku li dijberî gef û gurrên jinavbirina kurmançî û kirmanckî pêk anîne. Tiştê ku heye wî hêza van xebatan a parastina kirmanckî dernexistîye pêş.

Erdoğanlı û Orkin (2018) feydeyên Beşa Ziman û Edebîyata Zazakî ku di bin banê Zanîngeha Bingölê û Zanîngeha Munzurê de vebûye lêkolîn kirîye. Wan bi mebesta ku feydeya Beşa Zazakî ya li van zanîngehan bûye daye ber xwe û pê re jî wan derxistîye holê ku bi hindikî be jî fîrseteke baş ji bo çand û zimanê zazakî çê kirîye.

Aldatmaz (2021) lêkolîneke bi navê *Tehlike Altındaki Bir Dil: Kirmanca/Zazaca* di asta teza doktorayê de li ser rewşa bifîkar a kirmanckî amade kirîye.¹⁰ Ji ber ku UNESCOyê di rapora xwe de daxuyandîye ku dahatîya zimanê zazakî ne di nav ewlehîyê de ye, vê lêkolînerê hewl daye ku bi lêkolîneke zanistî ya xebata sehayî ya vê rewşê tesbît bike. Lêkolînerê, piştî ku faktorên mîna sosyo-ekonomîk, cografî û sîyasî yên ku dibin sedemê wendabûna zimanan dîyar kirine, dor anîye ser cîyê Yaşayan Diller Enstitüsü (Enstîtuyên Zimanên Zindî) û ketîye nava hûrgilîya xebata xwe. Ji bo seyra jinavçûna kirmanckî ya li Mamekîyeyê (Navenda Dêrsimê) tesbît bike, vê lêkolînerê li ser sê nîşên kirmanckîaxiv û îstatîstîka wan a bikaranîna zazakî, li gor metoda lêkolîna kanîtatîf (nicel) bi teknîka Anketa Bikaranîna Zimên û hevdîtîne (mulaqat), bi pirsên xwe yên amadekirî, digel hevkarên xwe derketîye qadê û ji beşeke unîverseya xwe ya dîyarkirî, ji axiverên kirmanckî yên ji temen û

⁹ Bnr. Salih Akın, “Diasporada Dil Planlanması: Kurmanca ve Zazacanın Karşılaştırmalı Analizi”, *Kurdoloji Akademik Çalışmaları*, (Edit. Hasan Karacan), Dicle Üniversitesi Basımevi, Diyarbakır, 2016, c. 1, r. 320-336.

¹⁰ Nadire Güntaş Aldatmaz, *Tehlike Altındaki Bir Dil: Kirmanca/Zazaca*, Vate Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul, 2021.

cinsîyetên cîyawaz daneyên xwe berhev kirine. Digel ku ji kirmanckîaxivên beşdar 71,9ê ji sedî, kirmanckî wekî zimanê xwe yê maderî dîyar dikin û 71,5ê ji sedî ji wan aîdîyeta xwe ya etnîkî wekî kirmanc-kurd qebûl dikin û di malabata wan de 92,8ê ji sedî yên ku bi kirmanckî dipeyivin hene jî, bes 77,7ê ji sedê wan di wextê tirs, hêrsbûn, duakirin, nifirkirin, xewndîtin û hejmartina reqeman de zimanê tirkî bi kar diênin. Dapîr û bapîr ne tê de, 70yê ji sedê wan bi dê û bav, xwişk û bira û hevsera xwe re zimanê tirkî bi kar diêne. 10,6ê ji sedê yê ji şênîyên unîverseya vê lêkolînê, hatine wê pileyê ku êdî ne bi kirmanckî dipeyivin, ne jî jê fehm dikin. Bi taybetî nifşê temenê 18 salîyê û bindestê wê, jixwe êdî naxwazin hînî kirmanckî jî bibin. Vê lêkolînerê bi vî awayî ev tesbîtên girîng qeyd kirine û xebata xwe bi dawî kirîye.

Komara Tirkîyeyê, bi destê Sazîya Bilind a Fêrkarîyê (YÖK) heft sal e ku ji bo kurmanckî, dimilî û suryanî, bi navê Enstîtuyên Zimanê Zindî yên li Tirkîyeyê enstîtu ava kirine û di bin banê wan de, li ser Makezanista Ziman û Çanda Kurdan, fêrkarî û perwerdeya master û doktoraya kurmanckî û dimilî dide kirin. Gotar û tezên ku lêkolîner wan bi zazakî û kurmanckî li ser zazakî dinivîsin, kovarên bihekem ên zanîngehên Tirkîyeyê wan diweşînin û li ser malpera xwe û “Dergipark”ê wan li dinyayê belav dikin. Armanca vê xebatê ew e ku şopa wê bigerîne bê ka gelo ev bizav û tevger îro di çî rewşê de ye? Sazîya Fêrkarîya Bilind a Dewleta Tirkîyeyê, di sê zankoyên xwe de, di bin banê Fakulteya Edebîyatê de cih daye Beşa Ziman û Edebîyata Zazakî û di asta lîsansê de tehsîla ziman û edebîyata kurmanckî û kirmanckî dide kirin, gelo heta niha ev bi kêrî çîyê dimilî hatine û a niha ev bizav di kîjan merheleyê de ye? Qutabîyên ku ji van fakulteyan mezûn dibin, çî dikin? Mebesteke vê xebatê ew e ku balê bikêşe ser vê rewşê û rista wê ya di biwarê pêşvebirina dimilî de tesbît bike. Wezîrîya Karê Perwerdeya Neteweyî ya Komara Tirkîyeyê ku ji bo asta perwerdeya dibistana navîn dimilî wekî derseke bijarte neqandîye, ka gelo bi kêrî çîyê kirmanckî hat? Dewleta Tirkîyeyê ev dersa hîlbijarte ya kirmanckî di çî rewşê de hiştîye? Çî feydeya vê derfeta fermî-dewletî gihaştîye dimilî? Ev gişt hêjayî lêgerîn û lêpîrsînê ne. Televîzyona peykî STÊRK, TRT, di nav bernameyên kanala fermî ya kurdî TRT KURDÎ û Radyoya Kurdî de, serê şeş salakî ye, digel kurmanckî û soranî, cih dide bernameyên kirmanckî (zazakî) jî. Gelo çî mifaya wan gihaştîye-digihêje dimilî? Çawa ku UNESCOyê di rapora xwe ya 21ê Subata 2009an de bi wesîleya *International Mother Language Day [Li Dunyayê Roja Zimanê Dayîkê]* ji dimilî re temenekî 50 salî ragihandîye, bi rastî jî kirmanckî dê piştî 40 salî bimire? Vê daxuyanîya vê sazîyê çî karîgerî li ser dil û derûnîya dimilîaxivan kirîye?

Di serdemeke ku dimilî di nav “mirin û jîn”ê de ye û ji ber kesîrîyê diperpîte, xebat û lêkolînên li ser wê, helbet gelek girîng û gewre ne. Bi qasî ku em pê agahdar bûn, heta niha li Başûr, xebateke bi vî awayî nehatiye kirin. Heger bi xêra vê xebatê berê dêhn û bala pispor,

zana û zanyaran bizivire ser dimilî, gewreyî û girîngîya wê bi wan bihête serwextkirin, hêvî çê dibe ku ew jî destê alîkarîyê bidinê û wê, ew bi awayekî siruştî li ser koka xwe hêşîn bibe û digel bira-kurdîyên xwe yên din, di biwarê standartbûna giştî ya zimanê kurdî de bibe xwedan karîgerîyeke erênî. Çunkî li gor dane û veguherînên pêvajoyê, bi awayekî zanistî xuya dike ku kirmanckî, di warê çanda nivîskî, hunerî, edebî û qadên curbicir ên jîyanê de çiqas zêde dihê bikarênan, ewqas ew û kurmanckî û soranî jî, di biwarê zimanê nivîskî de nêzî hev dibin.

Herçendî hindik be jî li hêla Bakur hestîyarek li ser dimilî heye; bes li Başûr û Rojhilat têkildarî û hestîyarîyeke berbiçav ku xwedîtî lê bike xuya nake. Bi vê xebatê hêvîdarî heye ku hestîyarîyek li van cîyan li ser dimilî çê bibe û erkeke dîrokî bihê pêkênan. Zana û zanyarên zimanê kurdî yê Başûr û Rojhilat, piştî vê xebatê dibe ku hîn bêtir meyla xwe bidin ser dimilî, derîyên medya, kolej û zankoyên xwe ji kirmanckî re jî vekin; karsaz û karmendên kanalên televîzyonên Başûr, di nav bernemayên xwe de cih bidin dimilî jî.

4. Hewldanên Parastin û Hêzdarkirina Dimilî

Çend nivîskarên navdar, bi keda xwe berhemên edebî yên gelên dunyayê werdigerênin kirmanckî. Çawa ku edîbên dimilî, berhemên edebî yên mîna hîkaye, roman, şano û helbestan bi dimilî dinivîsin, wan “ferheng”a kirmanckî ya bêjeyan, “ferhenga îdyoman”, pirtûkên “rêzimanî”yê û “rêbera rastnûştişê” jî ji bo dimilî çap kirine. Komeke bitecrube ya mîna Grûba Vateyî, nêzî 25 salan e ku bi awayekî pisporîyane (profesyonel) li ser standartkirina dimilî dixebite, kovareke perîyodîk bi navê *Vate* derdixê û pê re jî wekî weşanxane, bi navê “Weşanxaneyê Vateyî” berhemên nivîskaran diweşîne. Ji bilî vê grûbê, çend kovar û weşanxaneyên din ên mîna “Vejiyayîşê Tiji” û “Roşna” jî hene ku berhemên kirmanckî çap dikin. Di biwarê dijîtal de jî çend malperên serbixwe hene ku berhemên dimilî diweşênin. Dewleta Swêdê çend “çîrokên biwêne yên zarokan” bi derfetên xwe çap kirin û li Tirkîyeyê belav kirin. Ev qas ked, bername û xebat, dîsa jî têra wê yekê dikin gelo ku dimilî di nav axiverên xwe de berbelavî bibe da ku helwesta xwedîderketina li wê, biteyîse nav jîyana civakî/komeleyetî û rê li ber mirina wê bihê girtin, hêjayî mereqê ye.

5. Alfabeya Dimilî

Digel ku edîb û lêkolînerên dimilîyan metnên ewil ên kirmanckî bi alfabeya erebî nivîsîne jî, îro pîranîya wan bi alfabeya latîn ku Celadet Bedirxan ew amade kirîye xebatên xwe dinivîsin. Piştî ku derîyê unîversîteyên Tirkîyeyê li ber kirmanckî vebûn, di tezan de gava metnên klasîk cih digirin, êdî bi alfabeya erebî ya başûr jî metin tînin nivîsîn. Digel alfabeya Celadet, hin derdor hene ku xebatên xwe yên nivîskî yên kirmanckî, rasterast bi alfabeya tirkî dinivîsin; hinek derdorên herêma Dêrsimê jî bi awayê alfabeyêke din a latîn...

5.1. Alfabeya Erebî

Berhema ewil a edebî ya kirmanckî ku ji aliyê Mela Ehmedê Xasî (1867-1951) ve hatîye nivîsîn, bi alfabeya erebî ye. *Mewlûda Nebî*, sala 25ê meha adara 1315/1899an de bi awayê çapa lîtoğrafi bi qasî çar sed edetî/hebî li Dîyarbekirê hatîye çapkirin. Celadet Bedirxan ku berhema Osman Efendîyê Babic (1852-1929) a bi navê *Bîyîşa Pêxemberî (Mewlûd)*ê di kovara *Hawarê* de neşir kir û bi şûn de, piranîya nivîsên kirmanckî li gor terzê alafabeya wî hatine nivîsîn û weşandin. Qaymeqamê Puturgê yê qezaya Meletî Faîz Begê Bedirxanî, sala 1908an destxeta vê mesnewîyê bi xwe re birîye Stenbolê ku çap bike; çî feyde ji ber ku li wê derê kesî nekarîye destxeta wî bixwêne, nekarîye çap bike. Peyra Mîr Celadet Bedirxan sala 1933yan li Şamê ev di kovara *Hawarê* de çap kirîye. Ahmet Kirkan ku teza xwe ya masterê çap kir, metnê mewlûda Osman Esad Efendî, li gor rastnivîsîna alfabeya erebî ya soranî ya modern nivîsîye.

5.2. Alfabeya Latîn a Celadet Bedirxan

Çawa ku kovara *Vate*, digel hemû koma nivîskarên xwe alfabeya Celadet a latîn di nivîsên xwe de asas digire, çend weşanxane û kovar ne tê de piranîya kovar û weşanxaneyên kurmanc û kirmanc ên derveyî kovara *Vate* jî heman alfabeyê bi kar diênin.

5.3. Alfabeya Latîn a Şopgera Tirkî

Dewrûberên ku bawer dikin kirmanckî zimanekî xweser e, bi alfabeya tirkî berhemên xwe dinivîsin. Ew di alfabeya xwe de, digel tîpên Bedirxanî, tîpên alfabeya tirkî yên mîna [u], [ı], [ğ] bi kar diênin. Ew tîpa [û] û [î] bi kar naênin; li şûna tîpa [û]yê, tîpa [u]; li şûna tîpa [i]yê tîpa [ı]yê bi kar diênin. Zaza Dil, Kùltür ve Tarih Derneği/Komkarê Zun, Kan o Dêm ku li Bingolê ji sala 2015an ve kovara *Wisar* derdixe, li şûna gihaneka [û]yê, tîpa [o]yê bi kar diêne.

5.4. Alfabeya Latîn a Terzê Dêrsimî

Nivîskar û lêkolînerên dewrûberê Weşanxaneya Tiji vê alfabeyê bi kar diênin. Ev dormedor herçiqas bi giştî alfabeya Celadet bi kar diênin jî, mîna şopgerê alfabeya tirkî, herfa [ı]ya tirkî, li şûna herfa [i]ya Celadet bi kar diênin; li şûna herfa [û] ku li gor alfabeya Celadet gihanek e, herfa [u] bi kar diênin. Jixwe ew di alfabeya xwe de cih nadin pîta [îÎ]. Ew li şûna tîpa [u]yê, herfa alfabeya tirkî [ü]yê bi kar diênin. Digel van, ew di nav alfabeya xwe de cih didin pîta [ğ/Ğ] jî.¹¹ Wekî din ew li ber herfên req ên mîna [ç],[t],[k] û [p]yê nivdengêra [h]yê, wekî pevdeng, bi awayê [çh],[th],[kh] û [ph]yê bi kar diênin:

“Efsanê Khalmemê Sırriyo ke mî rasno sima wendoğu dest, bêşife kêmiye tey esta.”¹²

¹¹ Memê Jêle, *Khalmemo Sır*, Vêjîyaisê Tiji, Îst. 2003, r. 118.

¹² Memê Jêle, *Khalmemo Sır*, r. 15.

“Namê mı Heseno, ez dewa Halvoriye rao, mirê Hesên Aliê Sêy Kemali vanê. Marê Çê Sêy Kemali vanê, ma Abasunime. Mide nika serre re zêde serri şiyê. Qesa zêdiye, qesa fekê cuamerdi niya.”¹³

5.5. Nîqasha Ser Alfabeyê

Ev curecureyîbûna alfabeya kirmancî, xuya ye ji ber sedemên sîyasî ye. Çunkî ev cografyaya ku piraniya kirmancan lê dijîn, girêdayî desthilatdarîya Dewleta Tirkîyeyê ye û heta van salên dawî jî, axaftin û nivîsîna bi kirmancî li gor qanûnan qedexe bû. A niha kirmanc bi awayekî azad bi zimanê xwe dipeyivin, dinivîsin û dixwênin. Heta dewletê, ji bo kirmancî, derfetên fermî jî dane; bes ew derfet û bingeha ku hemû dormedorên entelektuel ên kirmanc, bi awayekî azad li hev bicivin û di nav xwe de alfabeyê standard biewîşênin (bineqênin) çê nebûye. Dildarên zazakî li bendê ne ku hemû dormedorên kirmancî jî li ser rêbereke rastnivîsîn û alfabeyê li hev bikin.

6. Weşanên Perîyodîk ên Kirmancî

Ebûbekir Pamukçu sala 1985an li Siwêdê dest bi weşandina kovara *Ayre* kirîye û xebatên li ser çanda zazakî belav kirine. Piştî 14 hejmaran dawî li weşana xwe anîye. Kovareke bi navê *Piya* di bin rêveberîya Pamukçu de, sala 1987an li Siwêdê dest bi weşanê kirîye. Kovara bi navê *Ware* ku li Almanyayê, sala 1992yan dest bi weşanê kirîye, kirmancî wekî zimanekî serbixwe hesabandîye û li ser vê xetê weşana xwe kirîye.¹⁴

Digel ku di kovarên kurmancî-tirkî yê mîna *Nûbihar*, *Rewşen*, *War*, *Bîr*, *Tirêj*, *Kelhaamed*, *Azadîya Welat*, *Verroj*, *Folklor Kurda*, *Folklorame* û kovara *Wyê* de jî nivîsên kirmancî dihatin weşandin, bi awayekî ku bi temamî cih bide nivîsên edebî-hunerî yê kirmancî, kovara *Vate* sala 1996an li Swêdê dest bi weşanê kirîye û hîna jî li Tirkîyeyê weşana xwe berdewam dike. Ev kom ji pisporên kirmanc ên herêmên cîyawaz li hev civîyane, wan komeke xebatê ava kirîye û vê kovarê diweşînin.¹⁵

Sala 2005an, kovara *Çime* li Almanyayê di heman xetê de dest bi weşanê kirîye. digel van, Kovara *Miraz* jî ku sala 2006an li Melatyayê dest bi weşanê kirîye, zazakî wekî zimanekî serbixwe hesabandîye.¹⁶ Kovarên mîna *Zazana*, *Wisar* û *Vir* jî weşana xwe dikin. Kovara *Zazana*, ji sala 2012an ve li Dîyarbekirê dest bi weşanê kirîye. *Zaza Dil*, *Kültür ve Tarih*

¹³ Cemal Taş, *Roê Kirmanciyê*, Vêjyayîşê Tiji, Îst. 2007, r. 15.

¹⁴ Murat Varol, “Etnik Yaklaşımlar Bağlamında Zaza Kimliği”, *Kimlik, Kültür ve Değişim Sürecinde Osmanlıdan Günümüze Kürtler*, Bingöl Üniversitesi Yayınları, Bingöl, 2013, r. 466-467.

¹⁵ Alî Aydın Çiçek, *Antolojîyê Şîranê Kirmancî (Zazakî)*, Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul, 2017, r. 23.

¹⁶ Murat Varol, “Etnik Yaklaşımlar Bağlamında Zaza Kimliği”, *Kimlik, Kültür ve Değişim Sürecinde Osmanlıdan Günümüze Kürtler*, r. 466-467.

Derneği/Komkarê Zun, Kan o Dêm, li Bingolê kovara *Wisar* ji sala 2015an ve derdixe. Wayir û berpîrsê kovara *Vir* Mehmed Aslanoğlu ye. Vê kovarê sala 2016an dest bi weşan xwe kirîye.

Rojnameya duhefteyî ya bi navê *Newepel* û kovara *Şewçila* jî çendakî, bi temamî nivîsên kirmanckî weşandin; lêbelê aniha rawestîyane. Herwiha malperên dijîtal jî hene ku berdewamî didin weşandina nivîsên kirmanckî. Piştî ku Dewleta Tirkîyeyê enstîtuyên zimanê zindî yên li Tirkîyeyê vekirin, di kovarên bihekem ên van enstîtuyan de jî gotarên zanistî bi dimilî hatin-dihên weşandin.

7. Xebat û Lêkolînên li Ser Gramera Dimilî¹⁷

Xebatên ku li ser kirmanckî hatine kirin, bi çend zimanên curbicur ên dunyayê ne. Mîna akademîsyenên rûs, lêkolînerên alman û îngilîz jî xebitîne û wan li ser gramera kirmanckî berhem nivîsîne. Xebatên gramera kirmanckî ku bi zimanê tirkî hatine nivîsîn, hema hema hemû ji aliyê kurmanc û kirmancan ve hatine amadekirin. Çawa ku hinek lêkolînerên kurmanc ew nivîsîne, bi giştî lêkolînerên kurmanc li ser gramera kirmanckî nivîsîne. Vê dawîyê lêkolerên kurmanc, bi kirmanckî û kurmancî jî xebatên li ser gramera kurmancî û kirmanckî çap kirine. Hinek ji van xebatan tenê li ser kirmanckî ne, hinek jî li ser berawirdkirina gramera kirmanckî û kurmancî ne. Di vê lêkolînê de çawa ku xebatên di formata gotarî de ku li ser gramera kirmanckî hatine amadekirin, li derve hatine hiştin, ew xebatên ku ji bilî tirkî, kurmancî û dimilî li ser kirmanckî hatine amadekirin jî li derve hatine hiştin û tenê ew xebatên ku wekî pirtûk li Tirkîyeyê hatine çapkirin li vir dê basa wan bihê kirin.

7.1. Xebatên li Ser Rêzimana Kirmanckî bi Zimanê Tirkî*

Çeko (1997) xebata xwe ya *Razarê Dımilki, Türkçe Açıklamalı Zazaca Gramer* nivîsîye û li Berlinê çap kirîye.

Erdem (1998) bi navê *Türkçe Açıklamalı Kürtçe Dil Dersleri (Zazaca)* lêkolîn nivîsîye û di nav weşanên Fîratê de çap kirîye. Navê wê ye bi kirmanckî, *Dersên Ziwenê Kurdî* ye. Di destpêka her mijarekê de metnekî sivik ê kirmanckî daye, ferhengokeke çekûyên/peyvîkên metnî daye û peyre ketîye mijara rêzimanîyê.

Çem (2003) berhemek bi navê *Türkçe Açıklamalı Kirmancca (Zazaca) Gramer* nivîsîye û li Stenbolê, di nav *Weşanên Deng* de çap kirîye. Digel ku zimanê vê xebatê tirkî ye jî, giranîyeke zêde ya riste û mînakên dimilkî derketîye pêş. Nivîskarî, çawa ku tarîfên xwe bi tirkî dane, kirmanckîya wan jî daye. Hemû mijarên rêzimanê tê de hatine nîkirandin. Alîyê

¹⁷ Ji bo berfirehîya vê mijarê bnr. A. Yıldız, "Lîteratura Manaşî ya Rêzimanîya Kurmancî û Dimilî û Rîsta Wê", *Kurdiyat*, 2021, j. 4.

* Li vir tenê navê wan xebatên ku wekî pirtûk hatine çapkirin hatine zikirkirin.

herî balkêş ê vê xebatê ew e ku “terîmên rêzimanîya dimilkî”, bi awayekî gelek pisporî hatine dayin. Rêzimanzanên kurmancî bi rehetî dikarin ji termînolojîya rêzimana wî mifa wergerin.

Gündüz (2006) xebata xwe ya *Türkçe Açıklamalı Kirmancca/Zazaca Dil Dersleri* amade kirîye û li Stenbolê di nav Weşanên Vate de daye çapkirin.

T. Erdem û O. Erdem (2012) *Dersên Zuwenê Kurdi-Zazaki (Dimili) û Sonikî* berhem amade kirîye. Weşanxaneya Arya ew çap kiriye.

M. Malmisanij (2013) lêkolînek bi navê *Kürtçede Ses Değişimi* nivîsîye û Weşanên Vate ew li İstanbulê çap kirîye. Nivîskarî, tîpên dengdêr û nedengdêr ên kirmanckî, kurmancî û kurdîya Başûr (sorani) digel hev berawird kirine û awayên guherînên wan dîyar kirine û li ber wan bi zimanê tirkî wateya bêjeyan daye.

Serkan Oğur (2014) xebata xwe ya *Farsça-Zazaca-Kurmancca Mukayeseli Gramer ve Temel Sözlük* nivîsîye û Weşanên Yazılamayê ew li Stenbolê çap kirîye.

Beki (2015) xebata xwe ya bi navê *Zazaca Dilbilgisi – Gramêr Zon Zazaki* di nav Bingöl Üniversitesi Yayınları de çap kirîye.

M. Malmisanij (2015) bi navê *Kurmancca ile Karşılaştırmalı Kirmancca (Zazaca) Dilbilgisi* lêkolîn nivîsîye. Mijarên mîna dengnasî, morfolojî, watenasî, beşên axaftinê û sentaksê girtîye nav xebata xwe û wî ev qayîdeyên kurmancî, digel ên kirmanckî/zazakî berawird kirine. Di nav vê berawirdiyê de carina cih daye agahîyên kurmancîya Başûr jî. Weşanxaneya Vateyê ew çap kirîye.

7.2. Berhemên li Ser Rêzimanîya Dimilî bi Dimilî

Wedat Kaymak (1995) xebateke bi navê *Elfaba Zaza: Ez Zazakî Bonder Bena* amade kirîye li Parisê çap kirîye.

Jandîl (2001) *Tekstê Kursê Kirmanckî yê Înstîtutê Ziwan û Kulturê Kirmanckî* lêkolîn nivîsîye û li Berlînê daye çapkirin.

Bîngol (2001) xebata bi navê *Tekstê Kursê Kirmanckî yê Înstîtutê Ziwan û Kulturê Kirmanckî* nivîsîye û li Berlînê daye çapkirin.

Fahri Pamukçu (2001) xebatek *Giramera Zazaki-Zuwan Rêznayi* amade kirîye; Tij Yayınları, li Stenbolê ew çap kirîye.

Gultekîn (2011) xebata xwe ya *Ro Ser Zarawayê Kirmanckî Xebata Gramerî* nivîsîye û di nav Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê de daye çapkirin.

Ferîda Sêwregî û N. Celalî (2011) xebateke bi navê *Ez Ziwanê Xo Musena* amade kirîye û wan ew di sala li Ankarayê bi awayê taybet çap kirîye. Tê de digel fotoyan rêzimanî û metnên edebî hene.*

Gultekîn (2012) *Musnêr (Kirmanckî Asta Yewine* amade kirîye û di nav Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Amedê de daye çapkirin.

Lezgîn (2012) *Dersê Ziwanî (Kirdkî/Kirmanckî/Zazakî/Dimilkî)* Weşanxaneya Roşna ew çap kirîye. Pirtûk 125 rûpel e.

Grûba Xebate ya Vateyî (2012) *Rastnûştişê Kirmanckî (Zazakî)* amade kirîye û Weşanxaneya Vateyî ew çap kirîye. Îmlaya/rastnivîsîna kirmanckî dîyar dîke û hêla wê ya rêzimanî jî heye.

Veroj (2014) berhema xwe ya *Veracêkerdena Gramerê Zazakî û Kurmancî* nivîsîye û Weşanên Ava ew çap kirîye. Amadekar, her beşeke wê, ewil bi kirmanckî/dimilî, peyre bi kurmancî nivîsîye.

Oğur (2014) xebata xwe ya bi navê *Zazakî/Kirmanckî Destûr (Gramer) be Qesey Kerdênê* di nav weşanên Weşanxaneyê Yazilamayê de çap kirîye.¹⁸

Asnaw (2015) xebateke bi n avê *Musnayox Asta Diyîne* nivîsîye û di nav Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê de hatîye çapkirin.

Ozkal (2017) xebata bi navê *Gramer û Rastnûştişê Kurdi/Kirdkî (Kirmanckî/Zazakî)* amade kirîye û Weşanxaneya J&J ew çap kirîye. Ozkal, bêjeyên pehlewî, avestayî û farisî dane ber kirmanckî û kurmancîya jorîn. Wî digel xalbendî û rastnivîsînê, ji hêla fonolojî, morfolojî û sentaksê/ristesazîyê ve li ser kirmanckî kûr bûye.

Qetekonij (2018) xebata xwe ya bi navê *Tayê Xususîyetê Fekê Şankuşî* di nav Weşanên Roşnayê de çap kirîye.¹⁹

7.3. Berhemên Gramera Dimilî bi Kurmancî

Aykoç (1996) xebata xwe ya *Kurdîzan: Rûberkirina Zaravên Kurdî* li Berlinê bi Weşanên Înstîtûta Kurdî datîye çapkirin. Di berhemê de beşa fonetîk û morfolojîyê heye. Nivîskarî, di beşa fonetîkê de dengên kurdkî, kurmancî û soranî berawird kirine; di beşa morfolojîyê de gava behsa binyada bêjeyan kirîye, digel bêjeyên kirdkî, kurmancî, soranî, bêjeyên feylî, bextîyarî, erdelanî (Sine) û goranî jî girtîye nav mijarê.

* Ferîda Xanim ev xebata xwe bi destê xwe weke dîyarî daye amadekarê vê lêkolînê.

¹⁸ Spas bo Pinar Yıldız Xoce ku wê ev pirtûk nîşanî me da.

¹⁹ Spas bo Pinar Yıldız Xoce ku wê ev pirtûk nîşanî me da.

Roşan Lezgîn (2013) bi n avê *Ji Bo Kurmancan bi Awayê Muqayeseyî Gramera Kirdkî (Zazakî)* gramera kirmanckî, ji bo kurmancîaxivan nivîsîye û li Dîyarbekirê, di nav Weşanên Roşna de çap kirîye.

İbrahim Bingöl (2020) lêkolîna xwe ya *Rêzimana Zazakî ya Devoka Gimgimê* di nav weşanên Avestayê de çap kirîye.

8. Dimilî li ber UNESCOyê

UNESCOyê di rapora xwe ya 21ê Subata 2009an de bi wesîleya “International Mother Language Day” [Li Dunyayê Roja Zimanê Dayîkê] ji bo dimilî alarmek da û ragihand ku ew dê piştî 50 salî bimire. Piştî vê daxuyanîyê, êdî navê dimilî rasterast bi xetera mirinê re dihê bilêvkirin. Dewleta Komara Tirkîyeyê ne tê de, ne civak, gel û dewletên cîran destê hêzdar ê alîkarîyê dirêjî dimilîyê dîkin, ne jî civak, gel û dewletên din ên dunyayê. Bêpişt û bêalamayîna dimilî, mîna arîşeyên din ên kurmancî, wekî beşek ji girîftayên zimanî, tenê li pêşberî xemxurên wê yên kurmancîaxiv û dimilîaxiv maye.

9. Piştevanîyên Parastina Dimilî

9.1. Enstîtuyên Zimanên Zindî

Dewleta Cumhuriyeta Tirkîyeyê, bi destê Yükseköğretim Kurumu [YOK]ê [Sazîya Fêrkarîya Bilind], heft sal e ku ji bo kurmancî, dimilî û suryanî, bi navê “Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü” [Enstîtuyên Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê], di bin banê sê-çar unîversîteyên xwe yên fermî de enstîtu ava kirine û di bin banê wan de, li ser “Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı” [Makezanista Ziman û Çanda Kurdan], perwerdeya “master” û “doktora”ya kurmancî û dimilî dide kirin.

9.2. Fakulteyên Edebîyatê

Sazîya Fêrkarîya Bilind a Dewleta Turkîyeyê, di du zankoyên xwe de (Tunceli Üniversitesi û Bingöl Üniversitesi), di bin banê “Edebiyat Fakültesi” [Fakulteya Edebîyatê] de cih daye “Zaza Dili ve Edebiyatı” [Beşa Ziman û Edebîyata Zazakî] û digel asta “lîsans”ê di asta lîsansa bilind û doktorayê de tederîs û fêrkarîya “dimilî” dide kirin; di du zankoyan de jî kurmancî û dimilî digel hev di bin navê “Kürt Dili ve Edebiyatı” [Beşa Ziman û Edebîyata Kurdî] de, di asta “lîsans”ê de tehsîla ziman û edebîyata kurmancî û dimilî, bi derfetên xwe yên dewletî dide kirin.

9.3. Gotarên bi Dimilî

Van salan êdî di kovarên bihekem ên “dergîpark”ê de gotarên akademîk ên bi kirmanckî dihên belavkirin. Helbet ev jî derfeteke mezin e.

9.4. Tezên bi Dimilî

Piştî ku rayedarên dewleta Tirkîyeyê derîyên zanîngehên xwe li ber zazakî vekirin, êdî tezên akademîk bi kirmanckî dihên amadekirin û li ser malpera neteweyî ya YOKê dihên belavkirin.

9.5. Dersa Dimilî li Dibistanê

Li teniştê van dam û dezgayên fermî yê dewletê, di bin banê zanîngehên taybet ên Stenbolê de, li Sabancı Üniversitesi û Bilgi Üniversitesi, ji sala 2009an ve dersa zimanê kurdî dihê dayîn. Digel van, qutabîyên Mardin Artuklu Üniversitesi [Zanîngeha Mêrdîn Artuklu], her di kîjan beş û fakulteyên din de bin, dikarin wekî “seçmeli ders” [dersa bijarte] derseke dimilî, yaxud kurmanckî di nav dersên xwe de bixwênin.

Türkiye Cumhuriyeti Milli Eğitim Bakanlığı [Wezîrîya Karê Perwerdeya Neteweyî ya Komara Tirkîyeyê], ji bo asta perwerdeya dibistana navîn, mafekî yasayî daye kurmanckî û kirmanckî ku wekî “dersa bijarte” bihên xwendin. Di çend serdeman de Dewletê bi awayê fermî mamosteyên kurmanckî û dimilî tayînî van dibistanên fermî jî kirin; lêbelê îro ev xebat ketine rewşa lawazîyê. Bi qasî ku ji encama van bizavên modern, demokratîk û adil dihatê hêvîkirin, têra dermankirina birîna kirmanckî/dimilî nekirîye. Çunkî zarokên dimilîxav ancax gava bi zimanê xwe ji dibistana seretayî pê ve perwerde bibin îstîqbala dimilî ji rîskê xelas dibe.

9.7. Kirmanckî di Kanalên Televizyonan de

Piştî ku televîzyona peykî STÊRK cih da bernameyên dimilî, Türkiye Radyo ve Televizyon Kurumu TRT [Sazîya Radyo û Televîzyona Tirkîyeyê] jî, hem di nav bernameyên kanala *televîzyona* fermî ya bi navê TRT KURDÎ de hem jî di nav bernameyên *radîyoya* TRT KURDÎ de, serê heft salakî ye, digel kurmanckî û soranî, cih dide bernameyên kirmanckî/dimilî jî. TRT KURDÎ, bi navê *TRT NÛÇE* malpereke kurdî jî damezrandîye û bi kurmanckîya nivîskî weşana xwe li serê dike. Zemanekî kanala esmanî ya bi navê JIYAN TV hemû bernameyên xwe bi kirmanckî dikir; bes a niha hatîye girtin.

10. Edebîyata Nivîskî ya Kirmanckî

10.1. Metnên Peter Ivanoviç Lerch

Li gor daneyên a niha, metnê ewil ê bi kirmanckî ku li ber destê me ye, Metnê Peter Lerch e. Ev lêkolerê rûs, di serdema Herba Qirimê de (1853-1856) ku hin kirmanc, di nav artêşa Osmanî de wekî dîl ketine destê artêşa rûs, ji xwe re wekî çavkanîya xebatên xwe dibîne û kirmanckîya ku ji wan guhdarî dike, hin berhemên edebîyata devkî, wekî metnên nivîskî amade dike û wekî kitêb, bi navê *Estaneka Hîrê Birayan, Aşîreta Sîwanî, Kişîyayîşê Mîrey*

Qerbegan Alî Axay Kelbanî, Damarî, Çemçeçû Paşa, Qawxê Nêrib û Sîwanî, Qewxê Nêrib û Hênî çap dike.²⁰

10.2. Metna Kurdische Texte *Gesammelt und Herausgegeben*

Kurdische Texte: Von Le Coq ev xebat amade kirîye û li Berlînê, sala 1903yan çap kirîye. Bergê yekem 72 rûpel e, bergê duyem 118 rûpel e. Nûser, di van her du bergan da hinek tekstên hikayetên kurmançî û zazakî berhev kirine û bi tîpên erebî belav kirine. Di nav wan tekstan de destxetêke *Newbehara Ehmedî Xanî* û destxetêke *Mewlûda Bateyî* heye.²¹

10.3. *Oçêrka Dîroknetewnasîyê ya Kurt di Derheqê Zazakî û Zazayan da*

Zimannasê kurd Qanatê Kurdo (1909-1985) çûye herêma Batûmê û li wir nêzî 25 malên kirmancan ku nêzî bajarê Batûmê ne tesbît kirine û wî hin metin ji nav wan berhev kirine û ji M. Malmîsanij re şandine û wî jî ew di kovara *Hêvî* de çap kirine. Qanatê Kurdo ev berhem bi zimanê rûsî nivîsîye, Tosinê Reşîd ji rûsî wergeraye kurmançî û ji bo çapê ji Seîd Verroj re şandîye. Temamîya wê ji 170 rûpelî pêk dihê.²²

10.4. Metnên Edebî yên Klasîk

Di edebîyata kirmanckî/zazakî de nivîskar û şairê yekem ku berhemên wî bi zimanê erebî, tirkî û kirmanckî hatine belavkirin, Mela Ehmedê Xasî (1867-1951) ye. Xasî ku wekî ronakbîr û alimekî muxalif ê desthilatdarîya serdema Osmanî û Cumhurîyeta nû bûye, di warê eqîde, sîyer, reddîyye û edebîyata Dîwanê de berhemên menzûm û pexşan bi zimanê erebî, tirkî û kurmançî û dimilî nivîsîne. Usman Efendî (1852-1929) ku hevdemê Mela Ehmedê Xasî (1867-1951) ye, wekî mewlûdnûsekî kirmanc, şair û edîbê duyem e ku bi kirmanckî mesnewîyeke mewlûdê nivîsîye. Çawa ku Xasî mulemmayek nivîsîye, Usman Efendî jî mulemmayek nivîsîye. Digel ku di mulemmaya Usman Efendî de mîna ya Xasî di pey rêzên erebî, farisî û tirkî de rêzên kurmançî û kirmanckî tunene jî, helbet ev hêla wî jî wekî teybetmendîyeke wî ya xweser e di nav edebîyata kirmanckî de. Ji lew re çawa ku Usman Efendî cîyê xwe yê edebî di nav edîb û alimên kurmanç û kirmancan de girtîye, pê re jî helbet cîyekî wî yê teybet di nav alim û edîbên serdema dawî yên Dewleta Osmanî de jî heye. Di pey van de şairên navdar ên mîna Mela Îhsan Alın el-Hezarşahî (1929-...), Mela Muhemedê Kavarî (1941-...), Mela Aziz Bekî (1945-...), Mela Faruq Baynal (1972-...) û Mela Muhemmed Elî Hunij jî di biwarê edebîyata klasîk a dimilî de berhem dane.

²⁰ Ahmet Kirkan, *Biyîşa Pêxemberî ya Osman Esad Efendî û Destxpêkê Edebîyatê Klasîk yê Kirmancî*, Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul, 2018, r. 37.

²¹ Spas bo Mamoste Yakup Aykaç ku wî pdfya vê xebatê bo me şand.

²² Spas bo Seîd Verroj ku wî "pdf"ya vê berhemê 19ê Êlona 2021ê ji bo vê gotarê şand.

10.5. Metnên Edebî yên Modern ên Kirmanckî

Ji ber ku binyada vê lêkolînê vê mijarê ranagire, em metnên edebî yên modern nagirin destî. Bes meriv dikare diyar bike ku di biwarê cureyên edebî yên mîna roman, hikaye, helbest û şanoyê de nivîskarên serdema me gelek berhemên hêja dinivîsin.

10.6. Metnên Akademîk

Piştî ku Tirkîyeyê di bin banê zanîngehên xwe de derî li dimilî vekirin, êdî gelek lêkolîneran tezên xwe bi dimilî nivîsîn û çap kirin.

11. Rewşa Dimilî ya di nav Dimilîyan da

Digel van xebat, pirtûk, kovar, dibistan, enstîtu, fakulte, tv û weşanxaneyan, dîsa jî bikaranîna kirmanckî di nav kirmancan de gelek lawaz e. Çawa ku UNESCOyê di rapora xwe ya 21ê Subata 2009an de bi wesîleya International Mother Language Day [Li Dunyayê Roja Zimanê Dayîkê] diyar kirîye, wisa xuya dike ku vê daxuyanîya vê sazîyê çî karîgerîyeke baş li ser derûnîya kirmanckîaxivan nekirîye. Çunkî di pey vê xebera daxdar de jî hemû dormedorên kirmanckînûs, hîna jî li hev necivîyane, wan jî xwe re rêyeke hevpar neeyîşandîye û lez û bez nedaye xebatên xwe yên lezgîn.

12. Zazakî di nav Mirin û Jînê de

Dimilî mîna kurmanckî li nav axivgerên xwe, di dibistanan de wekî zimanê fêrkirin û perwerdeyê, bi awayekî siruştî îro nahê bikarênan. Dê û bavên nifşek berî nifşê sedsala bîstî ku dizanibû bi dimilî bipeyive, zarokên xwe jî hînî kirmanckî dikir; lêbelê nifşê sedsala bîstî, digel ku bi dimilî dizane, bi zarokên xwe re pê napeyive. Zarokên vî nifşî, her çendî jî axaftinên dimilî fam dikin jî, nikarin pê bipeyivin. Îca ev nifşê dawî, ji ber ku bixwaze jî êdî nikare bi zarokên xwe re bi dimilî bipeyive, zarokên wan ne ji dimilî fam dikin, ne jî dikarin pê bipeyivin. Rasteqînîyeke li ber çavan e ku dimilî, di nav nesla nû de *kor* dibe.

Çawa ku dihê zanîn gava zarok bi zimanekî nepeyivin, helbet ew ziman dimire. Rewşa a niha ya kirmanckî, di çend gundan de ne tê de, li bajar û bajarçeyên wan li ber mirinê ye. Heta meriv dibîne ku li gundan jî êdî dê û bavên ciwan, dev ji hestên zimanî berda ye û bi zarokên xwe re bi zimanê fermî yê biperestîj dipeyivin. Her çendî di nav van 10-15 salên dawî de, bi xêra dildaran hinek liv û tevger di biwarê hişmendîya parastina dimilî de çê bûbe jî, ev neteyîsîye ser gel bi xwe; bes tenê di nav cîhana entelektuelan de tixûbkiî maye. Ji lew re xuya ye ev hewldan têra dermankirina derdê kirmanckî nake.

13. Nîqaş, Nirxandin û Encam

Hinek ji lêkolînerên tirk, dimilîyan bi bêjeya “zaza” bi nav dikin û hewl didin ku wan wekî tirk li qelem bidin, ermenî wan jî xwe, faris wan wekî faris û hinek lêkolînerên ewrûpî

jî wan wekî qewmekî serbixwe dihesibênin. Hinek kurmanç û gelek entelên kirmanc/dinbilî jî wan wekî kurd li qelem didin.

Lêkolînerên Rojava û Kavkas ji serê sedsala 20î ve dev ji lêkolînên têkildarî dimilî berdane. Pîranîya lêkolînên li ser dimilî û xebatên li ser gramera wê, ji aliyê dimilîaxiv û kurmançîaxivan ve hatine kirin. Weşanên periyodîk ên mîna kovaran, weşanxane, tev û malperên ku bi dimilî dixebitin, reng û rûyekî geş dane dimilî, Bi taybetî palpiştîya Dewleta Tirkîyeyê ya di biwarê zanîngehan de ji bo dimilî wisa dîyar e ku bi awayekî bêşik û bêguman temenê dimilî dirêj kirîye. Tiştê ku heye pêdivîya herî mezin a dimilî bi fêrkirin û perwerdeya wê ya dibistanê heye.

Daxuyanîya UNESCOyê ku dibêje 50 sal temenê kirmanckî maye, wisa xuya dike ku yekcar karîgerîyeke neçê li ser dil û derûnîya axiverên kirmanckî kirîye. Vê sazîya navborî, piştî vê alarmê, divîya destê alîkarîyê dirêjî kirmanckî bikira û ji bo çareserîya vê giriftê hewla alîkarîyê bida; bes heta niha nehatîye bihîstin û kesî behsa kedeke wê ya ji bo parastina dimilîyê nekirîye.

Herçendî xebatên ferdî-dildarî di biwarê weşanxane, kovar û rojnamegerîyê de hatin/dihên kirin jî, helbet hatîye dîtin ku têr nakin. Jixwe di nav weşanger, komele, akademîsyen û nivîskarên kirmanc/dimilî de dubendîya alfabe û awayê rastnivîsînê/îmlyayê jî heye û ev cîyawazî, wekî arîşeyeke mezin derketîye pêşberî kirmanckî. Di vê hêlê de kirmanc û kurmanç, çawa ku ji aliyê sîyasî, çandî û cografî ve hemqederê hev in, ji aliyê mafên zimanî ve jî di nav heman mercan de diqîlqîlin. Herçendî kurmançînûsan ev arîşeya navxweyî bi pîranî çareser kirîye jî, nivîskarên zazakî hîna jî yên xwe baş çareser nekirine.

Li ser bingeha vê lêkolîn û lêgerînê li sehaya lîteratura dimilî û bi tecrubeya deh salî ya di nav nas û malbatên dimilî û hevdîtinên ligel nivîskar û rewşwnbîrên dimilî em gihîştine van encaman:

- Herçiqas îro ji bo navê dimilî bêjeyên mîna kirmanc û zazakî dihên bikaranîn, di eslê xwe de bêjeya dimilî bêtir maqûl û berbelav e.

- Cografyaya ku dimilî lê dihê axaftin di nav axiverên kurmançî de xwedan qadeke berfireh e û digel wilayetên mîna Dêrsim, Çewlik û Dîyarbekirê, li bajarên mîna Siwêrek, Motka, Hawêl, Gimgim, Palo, Hênê, Silîva, Hezo, Gerger, Xarpêt, Erzincan, Çêrmûg, Çunguş, Erxenî û Pîranê û gundên derdora wan bi pîranî cîyên axiverên aktîf ên dimilî ne.

- Ji bo parastin û hêzdarkirina dimilî di serî de hin dildarên dimilî û derdorên civakî, Dewleta Tirkîyeyê derfetên xwe seferber kirine. Çawa ku xemxurên dimilîyan bi rêya kovar, weşanxane û organên medyayê hewla parastina dimilî dikin, Dewleta Tirkîyeyê jî bi dam û

dezagayên xwe yê fermî yê mîna zanîngeh, dibistan, tv, radyo û malperên dijîtal palpiştîya dimilî dike.

- Herçiqas alfabeke hevbeş û rêbereke rastnivîsînê ya hevpar a dimilî hîna jî nehatibe amadekirin, dîsa pîranîya arîşeyên vê qadê hatine çareserkirin.

- Hejmareke baş a weşanên perîyodîk ên nivîskî yê wekî kovaran di biwarê edebîyata nû ya dimilî de dixebite.

- Çi li welatên Ewrûpayê be çî jî li li herêma Kavkasê be gelek lêkolîneran li ser metnên rêzimana dimilî bi zimanên mîna rûsî, almanî û îngilîzî xebatên akademîk kirine. Ji xeyrî Ekola Oscar Mann a alman, hema hema hemû lêkolînerên Rojavayî ku li ser kurmançî û dimilî xebitîne, kirmanckî wekî dîyalekteke kurdî hesabandîye.

- Beşeke mezin a lêkolîner û zimannasên kurmanç, soran û dimilî, li ser rêzimana dimilî bi zimanê tirkî, dimilî û kurmançî lêkolîn amade kirine, çap kirine û pîranîya wan dimilî wekî dîyalekteke kurdî li qelem daye.

- Rewşa neçê ya dimilî bala UNESCOyê kêşaye û vê sazîyê nîvsedsalek bo temenê dimilî li qelem daye.

- Dimilî çawa ku di bin banê zanîngehên Tirkîyeyê de gihiştîye derfetên dewletî yê enstîtuyan û xwendekarên akademîyayê dikarin pê tez û gotaran binivîsin, di bin banê fakulteyên edebîyatê de dikarin di asta lîsansê de tehsîla dimilî bikin. Bi tevî vê derfetê di nav tixûbekî gelek hindik de be jî dewletê mamosteyên zazakî tayînî dibistanên navîn kirine û ew li dibistanan derseke bijarte ya dimilî didin.

- Digel çend kanalên taybet, kanala fermî ya Dewleta Tirkîyeyê TRT KURDÎ weşanên curbicur ên zazakî her roj diweşêne.

- Bi tevî van bervekirinên nû, hîna jî xeter, fikar û metirsîya mirina zazakî ji navê ranebûye.

- Kedkarên dimilî ji salên piştî 1990î ve ji bo bipêşvebirin û parastina dimilî bi tevî hemû derfetên xwe yê ferdî û komeleyatî dixebitin. Piştî salên 2000î Dewleta Tirkîyeyê digel derfetên akademîk, derfetên weşana TV û RADYOyê li ber dimilî raxist û reng û rûyê wê xweştir û geştir bûye. Bi xêra vê derfeta fermî ya dewletê, axiverên wê jî hinekî lê warqilîne. Ev jî cîyê kêfxweşîyê ye; bes têra bipêşvebirina wê ya siruştî nake.

12. Pêşnîyaz

Divê ku her dîyalektek bi azadî, digel derfetên xwe bijî û hemû dîyalekt di nav xwe de di warê destewajeyan de ji hev sûdmend bibin. Armanç bi vê xebatê ew e ku piştî dîyakirina van rewşan, berê dêhn û bala rayedarên Başûr jî bikêşe serê û bi vî awayî bibe wesîle/navgîn da ku rayedar, li herêma xwe dergehekî jîyanî bo kirmanckî vekin.

Çavkanî

Aydeniz, Veysel, röportaj yapan: Ayhan Yıldız. *Kirmanckî û Kurmancî* (25 08 2019).

Aykaç, Yakup. «Dîroka Zimannasîya Giştî û Xebatên Zimannasîyê di Kurdî de.»
Waneyên Zimannasîyê içinde, yazar Ümran Altıncılıç, 51. İstanbul: Lîs, 2016.

Badıllı, Kemal. *Türkçe İzahlı Kürtçe Grameri (Kürmançça Lehçesi)*. Ankara: Ankara Basım ve Ciltevi, 1965.

Bedirxan, Emîr Celadet, ve Roger Lescot. *Kürtçe Grameri*. İstanbul: Doz Yayınları, 1991.

Bingöl, İbrahim. «Fonolojîya Devoka Zazakî ya Gimgimê.» *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü*, 2017: 114.

Can, Mutlu. *Bibliyografyaya Kirmanckî/Zazakî (1963-2017)*. İstanbul: Weşanxaneyê Vateyî, 2018.

Çağlayan, Ercan. «Zazaların Etnik Kökeni.» *Kürtler (Tarih)* içinde, yazar Adnan Demircan, 288-289. İstanbul: Nida Yayıncılık, 2015.

Çem, Munzur. *Türkçe Açıklamalı Kirmancca (Zazaca) Gramer*. İstanbul: Deng Yayınları, 2003.

Çiçek, Alî Aydın. *Antolojîyê Şîranê Kirmanckî (Zazakî)*. İstanbul: Weşanxaneyê Vateyî, 2017.

Çirri, Reşîte, röportaj yapan: Ayhan Yıldız. *Dimilîya Zîyareta Weyselqeranî* (08 08 2019).

Çitçi, Hasan, röportaj yapan: Kelhaamed. *Hevpeyvîn li ser Zimanê Kurdî bi Prof Dr. Hesên Çitçi re* (12 10 2014).

Erdem, Turan. *Kürtçede Dil Dersleri Zazaca*. İstanbul: Fırat Yayınları, 1998.

Gultekin, Sabahattin. *Ro Ser Zarawaya Kirmanckî Xebata Gramerî*. İstanbul: Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, 2010.

Gustoyic, Nesibe, röportaj yapan: Ayhan Yıldız. *Estanekê Kirmanckî* (12 06 2005).

Gündüz, Deniz. *Türkçe Açıklamalı Kürtçe Kirmancca/Zazaca Dil Dersleri*. İstanbul: Vate Yayınevi, 2006.

Jêle, Memê. *Khalmemo Sir*. İstanbul: Vejiyaişê Tiji, 2003.

- Keskin, Mesut. «Zaza Dili (Zaza Language).» *Bibgöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi* , 2015: 99.
- Kirkan, Ahmet. *Bîyîşa Pêxemberî ya Osman Esad Efendî û Destpêka Edebîyatê Klasîk yê Kirmanckî*. İstanbul: Weşanxaneyê Vateyî, 2018.
- . *Bîyîşê Pêxemberî ya Osman Esad Efendî û Destpêka Edebîyatê Klasîk yê Kirmanckî*. İstanbul: Weşanxaneyê Vateyî, 2018.
- Kurdo, Qanatê. *Rêzimana Kurdî: Kurmancî-Soranî (Ji Soranî: Zülküf Ergün)*. İstanbul: Nûbihar, 2013.
- Lezgîn, Roşan. *Dersê Ziwani*. İstanbul: Weşanxaneyê Roşna, 2012.
- Malmîsanij. *Ferhengê Kirdkî-Pehlevkî-Kurmanckî*. Spanga: Apec, 1997.
- Malmîsanij, M. *Kurmancca ile Karşılaştırmalı Kirmancca (Zazaca) Dil Bilgisi*. İstanbul: Weşanxaneyê Vateyî, 2015.
- . *Kurmancca ile Karşılaştırmalı Kirmancca (Zazaca) Dilbilgisi*. İstanbul: Weşanxaneyê Vateyî, 2015: 32.
- . *Kürtçede Ses Değişimi*. İstanbul: Weşanxaneyê Vateyî, 2013.
- Marif, Ewrehmanî Hacî. *Raberî Serçawe Le Barey Zimanî Kurdîyewe*. Bexda: Kolêjî Berewey Zankoy, 1989.
- Ozkal, Hacî. *Gramer û Raştênîştîşê Kurdî/Kirdkî [Kirmanckî/Zazakî]*. Ankara: Weşanên J&J, 2017.
- Öpengin, Ergin. *Rewşa Kurdî ya Sosyolenguîstîk li Tirkîyeyê*. İstanbul: Avesta, 2011.
- Sevgen, Nazmî. *Zazalar Kızılbaşlar: Coğrafya-Tarih-Hukuk-Folklor-Teogoni*. Ankara: Kalan Yayınları, 1999.
- Tan, Samî. *Rêzimana Kurmancî*. İstanbul: Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, 2015.
- Taş, Cemal. *Roê Kirmanciyê*. İstanbul: Vêjyayîşê Tiji, 2007.
- Tay, Mela Yûsuf, röportaj yapan: Ayhan Yıldız. *Têkilîya Kirmanckî bi Kurmancîya Jêrîn ra* (09 07 2019).
- Varol, Murat. «Etnik Yaklaşımlar Bağlamında Zaza Kimliği.» *Kimlik, Kültür ve Değişim Sürecinde Osmanlıdan Günümüze Kürtler*. Bingöl: Bingöl Üniversitesi Yayınları, 2013. 466-467.
- Vate, Gruba. *Ferhen: Türkçe-Kurmancca; Kirmanckî-Tırki*. İstanbul: Weşanxaneyê Vateyî, 2013.

Veroj, Seîd. *Mehmed Mîhrî Hîlav û Kovara Kurdistan*. İstanbul: İsmail Beşikçi Vakfı Yayınları , 2015.

—. *Veracêkerdena Gramerê Zazakî û Kurmancî*. İstanbul: Ava, 2014.

—. *Veracêkerdena Gramerê Zazakî û Kurmancî: Dîyalekt, Alfabe û Fonetik, Morfolojî*. Diyarbakır: Ava, 2014.

Xasî, Mela Ehmedê. *Mewlûdê Nebî, (Tadoxê Tîpane Erebî ra: Mihanî)*. İstanbul: Fırat Yayınları/Weşanên Fırat, 1994.

علی بدرخان، جلادت علی. 1933: 1=6. *هاوار*، «زار، دولی و مولودا عثمان ئفندی».

1434&بیروت: دار النفائس، 2013 *معجم النفائس النسانی*. حسین، عبدالله روبین

..هولیر: چاپخانهی رۆژههلات، 2010 *زمانهوانی*. خوشناو، نهریمان

تهران: شرکت افست، 1384. *واژ آموزی زبان فارسی (سطح مقدماتی)*. عسکری، مهناز

2017: 115=119. *خال*، «دیوی شاردر او هی پهیوهندی ئهر مهن و زازا». ئهحمهد، هینمن عومهر